

# Fêrbîn u Fêrkirin ya Zimanê

## Peydaçûnê Guharrtinê yê Rêzmanê

(Qewa'dê). Rêzmana Behdînî fêr be yan fêr bike piç. Êk behira ristê (cimlê) fêr be u paşî êke dî. Peydaçûnê guharrtinê bi kar bîna da tu fêrbîna xu bastir qayim bikî. U paşî li gel hevalêt xu yê Behdînî biaxe.

Bi peydaçûna guharrtinê, her car hizira xu deyne ser pişkê ji ristê u peyva serekî biguhurre gel peyva dî. U husa tu dişê hindek ristê cida cida bi kar bînî. Hêma rista bi dengê bilind bêje. Eve dê harî karîa te kit da tu bişê bi rêkekî taze u baş bixivî.

Tu jî dişê karta bi wêna yan bi peyva çêkî da harî karîa te bikit bu bîrîna pişka ristê.

Li bin da hindek peydaçûnê guharrtinê yê numune bi rista *Dihî ez çûm sîkê*.

Hindek karta çêke da pişka ristê dîar bike. Eve dê harî karîa te kit bu dîtina deynana ristê.

dem	babet	kirin	paşnav	cih	paşnav
Dihî	ez	çû	-m	sîk	-ê.

Ev riste şeş pişkê heyn: dem, babet, kirin, paşnav, kîrnê, ci, paşnav ci. Her pişk dişê bêt biguhurrit.

Tu jî dişê wêna dirist bikî (pêş nivîsandina peyva ve) li ser karta da harî karîa te kit guharrtina çêkî. Bu numune bu peyvê "**cihê**":

- hindek fêqîa dirist bike (bu sîkê)
- pirekê dirist bike
- xaçekê dirist bike (bu dêrê)
- nîşana dermanê dirist bike (bu xestê)
- kitêbekê yan xanîekê dirist bike (bu qotabxanê)

Tu dişê riznamekê (teqwîmekê) bi kar bînî da guharrtinê "**demê**" dîar bikî.

Tu dişê rismê miruva (husa: 王五支五丫个儿) dirist bikî da guharrtinê "**kirinê**" dîar bikî.

## Peydaçûnê Guharrtinê

**dem** - Peyva "demê" biguhurre.

Dihî Evru siharê Şevê dî Pêr Heftîa çû	ez çûm sîkê.
--	--------------

**cih** - Peyva "cihî" biguhurre. **Paşnav ci** (van peyva) naguhurrit.

Dihî ez çûm	sîkê. pirê. dêrê. xestê. qotabxanê.
-------------	---

**kirin** u **ji / li** - Peyva "kîrnê" biguhurre. U ji ber kîrna, deynana rista biguhurre u peyva "ji" yan "li" zêde bike.

		çûm	sîkê.
Dihî ez	ji	zivirrîm.	hatim.
	li	mam.	nivistim.
		rîniştim.	

**babet** u **paşnav kirinê** - Babetê biguhurre – u ji bîr ne ke paşnav kîrnê jî biguhurre. U heker te divê, rista **ne** bêje.

	ez		-m	
	tu		-î	
Dihî	ew	ne	çû	sîkê.
	em		-în	
	hîn		-n	
	ew		-n	